Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar : 419 nameronahi@gmail.com 23 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Jiyan bi xwezayê xweş e, nehêlin xweza bê talan kirin

*Welatiyê ji Qamişlo yê bi navê Îsam Elî ku ev sale gulan difroşe di hewşa mala xwe de 500 cureyê kulîlk û daran çandiye. Îsam diyar kir ku ew ji jiyana bi xwezayê re gelekî hez dike û got, “Mixabin niha hemû der bûye beton. Em jî divê li dijî talankirina xwezayê zedêtir kulîlk û dar biçînin.”*







Gulfiroşê 20 salan Îsam Elî di hewşa mala xwe de 500 cure kulîlk û dar çandine, nebûna cih ji xwe re asteng nabîne û dibêje ku xweza rih û jiyana wî geş dike.

Roj bi roj wateya xwezayê winda dibe. Bi pergala kapîtalîzmê cîhan giştî di bin betonê de tê dorpêçkirin. Xwezaya civakê bi bermahiya fabrîqe, jêkirina daran û qirêjkirina avê dihele ku xweza zirar bibîne û dem bi dem xweza li gorî berjewendiyên kesan tê qetilkirin. Li dijî pergala kapîtalîzmê rihê xwezayê hê jî li ber xwe dide. Îsam Elî jî yek ji alîgirên berxwedana xwezayê ye.

Îsam Elî 42 salî ye û bavê 3 keçan e. Li bajarê Qamişlo li taxa Zeytûniyê dijî. Bi hevjîn û birayê xwe re karê gulfiroşiyê dike. Li dijî hemû astangiyan xwestek û bawerî, hêza wan dihûne. Îsam di 15 saliya xwe de dibihîze ku xweza di xwîna wî de cih girtiye. Di navbera wî û xwezayê de girêdanek diafire û xala zincîrê bi çandina kulîlkan rihan dest pê dike. Hêdî hêdî fêrî çandinî, taybetmendiyên kulîlk û daran dibe û dest bi karê gulfiroşiyê dike. Di destpêka kar de malbata Îsam jê ne bawer bû. Lê hewldana wî hemû bêhêvî şikandin û hişt ku malbat jî bi xwezayê re were girêdan.

## 500 CURE KULÎLK Û DAR ÇANDIYE

Îsam ji ber tunebûna cih kulîlk û daran di nava mala xwe de diçîne. Tunebûna cih ji xwe re asteng nabîne û çareseriyê jî hewşa mala xwe de dibîne. Îsam li hewşa xwe de nêzî 500 hijmar kulîlk û dar diçîne. Navên hin kulîlk û darên ku diçênin wiha ne; rîhan, kenaf, mistexiyê, xeydokê, dara biçûk a sêva, dara biçûk a hinara, sicadê, gûlên biçûk, zambaq, cegerxwîn, mahkeme, dare tirî û hwd.

Di meha Sibatê de dest bi çandiniya kulîlk û daran dikin. Ji meha Adarê heya Tebaxê di nav kolanan difiroşin. Ji bo amadekariya sala were jî tov kom dikin.

Bi rihê jiyana hevbeş, Îsam û hevjîna wî Fatma di nav hewşê de kulîlk û daran diçînin, birayê Îsam, Hacî Elî (58) jî li ser erebeya destan kulîlk û daran bi cih dike û kolan kolan digere, wan difiroşe. Îsam diyar dike ku hemû jiyana wan bi hev re tê meşandin û wiha dibeje: “Jixwe xweza di xwîna min de cih digirt. Ji bo berdewama xwedîderketina li xwezayê ez wî karî dikim. Xweza rihê min zindî, jiyana min geş dike.”

Îsam zarokên xwe jî ferî karê xwe dike û diyar dike ku rihê parastina xweza û hezkirinê di dilê zarokên wî de jî tê çandin. Gazina Îsam li ser xerabkirina xwezayê heye û wiha lê zêde dike: “Parastina xwezayê nayê kirin, tenê ji bo sembol dar û kulîlk tên kirîn. Ew mijar min pir xemgîn dike. Kesên ku pereyên wan tune bin lê hezkirina wan ji xwazayê re hebe, kulîlk û daran bê pere didimê.”

## 7 SALAN KAR DISEKINÎNE


Beriya Şoreşa Rojava dewleta tirk a dagirker li ser sînorên bajarê Qamişlo gule diavêtin malên welatiyan. Her wiha dewleta tirk av jî li ser gelê Qamişlo qut dikir. Mala Îsam li taxa Zêytûniyê ser sînor disekine û gelek caran bûye hedefa guleyên leşkerên tirk. Ji ber sedema ewlehiyê û kêmbûna avê, Îsam demekê kar dide sekinandin û diçine gunde Girbawî yê girêdayî bajarê Qamişlo. Sekinandina kar wî xemgîn dike û sala çûyî dîsa vedigere ser karê xwe û dest bi çandina kulîlk û daran dike.

Îsam li ser xwezayê wiha dibejê: “Saetên sibehê beriya xwarinê bixwim, kulîlk û daran av didim. Dema ku ez bi xwezayê re mijûl dibim, dar û kulîlkan diçînim, wekî ku jiyanake nû ava dikim. Çawa ez zarokên xwe xwedî dikim, dar û kulîlkan jî xwedî dikim. Tîbûna kulîlk û daran tîbûna zarokên min e.”

## NEHÊLIN XWEZA BÊ TALANKIRIN

Îsam Elî di dawiyê de diyar kir ku xwesteka wî ew e ku hemû mirov xwezayê biparêzin û lê xwedî derkevin û got: “Kesen karê gulfiroşiyê dikin kêm in. Di demên berê de mirovan xweza diparast û hestên wan jî zindî dibûn. Hewşên gel hemû kulîlk û şînkayî bûn. Lê mixabin niha hemû der bûye beton. Em jî li dijî talankirina xwezayê zedêtir kulîlk û dar biçînin û heya dawiya temenê xwe ez ê karê xwe bidomînim.”...***Mûrad KENDA / Qamişlo***

# Vegerîn gundê xwe û komîn ava kirin



Li nançeya Bedlîsê Tetwanê 5 gundiyên di 1990’î de ji gund hatin derxistin û di 2009’ê de vegeriyan gundê xwe hatin cem hev û kooperatîfa bi navê Kavar ava kirin. Kooperatîfa Kavar wek nimuneyeke serkeftî ya aboriyê derket pêş û di komunê de 40 jin hilberînên xwezayî hildiberînin. Dahatuyê jî di nav xwe de wekhev parve dikin.

5 gundên di navbera Tetwana Navçeya Bedlîsê û Wanê de dimînin û di 1990’ê bi zorê hatin valakirin hatin cem hev û Kooparatîfa Lipêşxistina Çandiniyê ya bi navê Kavar ava kirin. Kooparatîfê di Çileya 2009’ê de dest bi xebatê kir û her diçe xwe mezin dike. Seroka Desteya Rêveber a Kooperatîfa Lipêşxistina Çandiniyê ya Kavar Gurgîn Karabey da zanîn ku wan di destpêkê de bi 3 jinan dest bi vê xebatê kir. Lê niha em 40 jin bi hev re dixebitin. Kooperatîfa me ji sedî sed hilberîna xwezayî ya nok, beqlik, hingiv û hwd. dike.

Karabey da zanîn ku gundiyên Dîbek, Duzceala, Bolalan, Kolbaş û Yassı hatine gel hev û kooperatîf ava kirine û wiha got: “Kavar navê cih û warê 6 gundên ku di navbera Wan û Tetwanê ye û di 1990’ê de hatin valakirin re tê gotin. Herêmeke biçûk e. Lê pir bi bereket e. Xwedî zozan û goleke xweşik e. Gundiyên di 1990’ê de ji gundên wan hatin derxistin, di 2000’ê de vegeriyan. Gelên Kavar ji aboriyê ve lewaz bûn. Me jî wek fikrek dê çewan karibin bibin destek û vê karê kooparatîfê li pêş xist. Kooperatîfa me ji kooperatîfên din cihêtir e. Armanca me ev e gelên li Kavar dijîn muhtacê tu nekesan nebin û me baweriya wan a ji bo ked û pergala wan a aboriyê re xurtir kir. Feraseta me ya kooperatifê jî ev e. Niha di kooperatîfê de 40 jin dixebite. Hedefa me meztire. Em dixwazin hê zêdetir jinan di kooperatîfê de bicihkin û derfetê aboriyê ji bo wan bidin afirandin. Ez jî wek karkereke ji dil di kooperatîfê de dixebitim.”...***MA***

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 419 23 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## QSD li Dêrazorê pêşde diçe



Pêngava Bagera Cizîrê bi hemû leza xwe berdewam dike. Tevî germa zêde jî şervanên QSD’ê li Dêrazorê li dijî çeteyan serkeftinên mezin bi dest dixin. Şervanên QSD ji ko parastina giştî herêmê hedef dikin ku hebûna DAIŞ’ê li herêma rojhilatê firatê bi dawî bikin.***R-2***

# DIVÊ EM DI DANÎNA DESTÛRÊ DE HEBIN



## TI DAN Û STANDIN TUNE YE

16 Partî û Tevgerên girêdayî Rêveberiya Xweseriya Demokratîk û MSD’ê derbarê îdiayên danûstandinên bi rêjîmê re û her wiha amadekirina destûrabingehîn ya nû a Sûriyê de daxuyaniyek dan. Di daxuyaniyê de wiha hat gotin, “Heta niha bi rêjîmê re ti dan û standin pêk nehatine. Lê em ji dan û standinên bi armanca çareseriyê re amade ne.”

## ÇARESERIYA DEMOKRATÎK PÊWÎST E

Di daxuyaniyê de tê gotin ku îdiayên derbarê danûstandinan ku tên kirin bi armanca derxistina tevliheviyê ye. Di daxuyaniyê de li ser destûra Sûriyê jî ev tişt tên gotin, “Yekane rêya dawîkirina aloziya Sûriyê çareseriyeke demokratîk e. Hêzên ku teror li Sûriyê têk birine mafê wane ku beşdarî danîna destûreke nû ya Sûriyê bibin. ***R-4***

## Hovîtiya dewleta Tirk a li Efrînê vegot




Dewleta Tirk û komên xwe yên çete li Efrînê bi her awayî kiryarên der mirovahî li dijî welatiyên Efrînê didomînin. Ciwanekî Efrînî ku xwe ji dagirkerên Tirk rizgar kir, qala hovîtiya dewleta Tirk kir û got, “Leşkerên dewleta Tirk, çete û ENKS bi hev re tevdigerin. Li nava gundan digerin û êşkenceyê li welatiyan dikin.” ***R-5***

## HPG derbên giran li dagirkeran dide



Çalakiyên gêrîlayên HGP’ê li başûr û bakurê Kurdistanê li dijî artêşa dagirker ya Tirk berdewam dikin. Gêrîla di van çalakiyan de derbên giran li artêşa tirk didin. Navenda Ragihandinê ya HPG’ê derbarê çalakiyan de daxuyanî da û diyar kir hêzên wan li Başûrê Kurdistanê, Colemêrg, Agirî û Wanê çalakî kirin û 7 leşker hatin kuştin. ***R-2***

## Armanca HSM’ê Sûriyeke pir-reng e



Partiya Sûriyê ya Pêşerojê bi armanca danasîn û nirxandina armancên partiya xwe ji rewşenbîrên Hesekê re civînek li dar xist. Bi dehan rewşenbîr beşdarî civînê bûn. Serokê Partiyê Îbrahîm El-Qeftan axivî û partiya xwe da nasandin. El-Qeftan destnîşan kir ku armanca partiya wan avakirina Sûriyeke pirreng û demokraîk e. ***R-4***

## Jinên Sûriyê rê nîşanî jinên Rojhilatanavîn dan



Kongreya Damezirîner a Rêxistina Jinan a PYD’ê bi dirûşma “Azadiya jinan mîsogeriya civaka exlaqî û siyasî ye” li Navenda Aram Tîgran a Çand û Hunerê ya bajarokê Rimêlanê hat lidarxistin. Bi sedan endamên jin ên PYD’ê yên Bakurê Sûriyê û Ewropayê beşdarî kongreyê bûn. Hevseroka PYD’ê Eyşe Hiso di kongreyê de axivî û diyar kir ku jinên Sûriyê bi têkoşîna xwe rê nîşanî hemû jinên rojhilatanavîn dan. ***R-3***

## Em ji projeya Sûriya demokratîk venagerin



Endamê Desteya Serokatiya Meclisa Sûriya Demokratîk Hikmet Hebîb di bin konê sersaxiyê yê pismamê xwe yê ku di 20’ê Tîrmehê de şehîd bû axivî û wiha got, “Destên me herdem ji bo dan û standinan û ji bo çareseriya aloziya Sûriyê vekirine. rêjîma Sûriyê heta niha jî naxwaze aloziya Sûriyê bi rengê aştiyane bê çareserkirin. Em dev ji projeya avakirina Sûriyeke demokratîk û nenavendî bernadin.” ***R-4***

## Şerê li Îranê wê girantir be



Îran jî cihê xwe yê di rojeva cîhanê de diparêze. Serokkomarê Îranê Hesen Rûhanî, serokê DYA’yê Donald Trûmp hişyar kir û got, “şerekî gengaz ê li Îranê wê ji her şerî girantir be.” Hat ragihandin, Rûhanî li pêşberî dîplomatên Îranê axivî û got, “Birêz Trûmp, bi teriya şêr nelîzin, ev ji poşmaniyan wêdetir bi kêrî tiştekî nayê.” ***R-5***

# QSD li Dêrazorê pêşde diçe

***Pêngava Bagera Cizîrê bi hemû leza xwe berdewam dike. Tevî germa zêde jî şervanên QSD'ê li Dêrazorê li dijî çeteyan serkeftinên mezin bi dest dixin. Şervanên QSD ji ko parastina giştî herêmê hedef dikin ku hebûna DAIŞ'ê li herêma rojhilatê firatê bi dawî bikin.***

Tevî bilindbûna pileya germahiyê şervanên Hêzên Sûriya Demokratîk hemleya Bagera Cizîrê berdewam dikin da ku hebûna çeteyên DAIŞ'ê li giştî rojhilatê çemê Firatê bi dawî bikin.

Qonaxa duyemîn a Pêngava Bagera Cizîrê bi pêşengiya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) di roja xwe ya 48'emîn de berdewam dike.

Şervanên QSD'ê li sehraya rojhilatê Dêrazorê bi ser komikên çeteyên DAIŞ'ê de diçin.

Bi armanca parastina giştî herêmê û sînorên di navbera Sûriye û Iraqê de pêdivî bi rizgarkirina beyarê zêde ye. Li aliyê rojhilatê beyarê bajarokên El-Sor, El-Mergede û her du bîrên petrolê yên Tenek û El-Umer hene.

Ev herêm ji ber êrîşên çeteyên DAIŞ'ê yên dubare keti nav rewşeke aloz û di encamê de rizgarkirina beyarê û girêdana bi bajaroka El-Baxoz a stratejîk ve gelekî girîng e.

Şervanên QSD'ê ji 3 aliyan ve derbasî beyara Dêrazorê dibin. Beşek ji aliyê sînorên di navbera Sûriye û Iraqê de li ser hesabê çeteyan pêşve diçe û koordîneyê bi hêzên Iraqê re dike. Di beşa duyemîn de şervan ji bajarokê El-Mergede ve pêşve diçin û aliyê sêyemîn jî ji bajarokê El-Sor pêşve diçin û di van rojên borî de bêtirî hezar û 200 km ji destên çeteyên DAIŞ'ê hat rizgar kirin.



## Çeteyan jiyan li gel herimandine



Hate ragihandin, çeteyên dewleta Tirk a dagirker dor li navçeya Cindirêsê girtine û nahêlin kes biçe navçeyê û ji navçeyê derkeve.

Li gorî agahiyên ji çavkaniyên herêmî yên li navçeya Cindirêsê hatin girtin, komên çete yên Farûk û Margzgah a Rojhilat, dor li herêma başûr a Cindirêsê girtine.

Ji sibeha Yekşemê ve destûr ji ketin û derketina şêniyên navçeyê nayê dayin û li gelek cihan sekvan hatine bicihkirin. Hate gotin, çete li ser girên li dora navçeyê jî bi cih bûne.

Li Cindirêsê dema dawî gelek mirov hatin revandin, girtin û mal û milkên welatiyan hatin desteserkirin. Komên çete gelek mirov revandin û birin cihên nediyar.

Ji ber vî sûcê şer, dayik roja Şemiyê li ber navendên dewleta Tirk û çeteyên wan li hev kom bûn û ji bo berdana zarokên xwe çalakiya protestoyî kirin.

Li gorî çavkaniyekî din, piştî ku welatiyek ji aliyê komên çete ve hatin revandin û kuştin û destdirêjî li jinan kirin, vê yekê di nava şêniyên Efrînê de rê li ber hêrseke mezin vekiriye. Gel dixwazin dagirker tavilê ji cih û warê wan derkevin.

## Li Kirmaşanê erdheja pêk hat



Li eyaleta Kirmaşanê ya Rojhilatê Kurdistanê bi dijwariya 5.9 pileyî erd hejiya. Gelek bajarên Başûrê Kurdistanê jî bi erdhejê hesiyan. Navenda Lêkolîna Erhejê ya Zanîngeha Tehranê ragihand ku navenda erdhejê herêma Taza Abad a Kirmaşanê ye. Hate gotin, erdhej li gorî dema herêmî saet 13:15'an bi 8 kîlometreyan li binê erdê rû daye. Tevî bajarên Sine, Kirmaşan, Îlam û Ûrmiye yên Rojhilatê Kurdistanê, herêmên Germiyan, Helebçe, Silêmaniye, Raperîn û Derbendîxan ên Başûrê Kurdistanê jî bi erdhejê hesiyan. Li Çiyayê Banglo yê li nêzî bajarê Ciwanro yê Kirmaşanê, ji ber erdhejê gelek teht wergeriyan. Li ser encama erdhejê heta niha daxuyanî nehatiye dayin. 12'ê Mijdara 2017'an li Kirmaşanê erdhejek bi dijwariya 7.3 pileyî rû dabû û herî kêm 620 kes miribûn, zêdeyî 8.500 kes birîndr bûbûn.

## HPG derbên giran li dagirkeran dide



Gerîlayên HPG'ê li Başûrê Kurdistanê, Colemêrg, Agirî û Wanê çalakî kirin û 7 leşker hatin kuştin.


Navenda Ragihandinê ya HPG'ê derbarê çalakiyan daxuyanî da. Hate gotin hêzên gerîla ''Bi çarçoweya Pêngava Şoreşger a ŞehHîd Pîroz û Şehîd Agirî'' 21'ê Tîrmehê li dijî 'artêşa Tirk a dagirker çalakî kirine.

Agahiyên berfireh ên derbarê çalakiyên hêzên gerîla wiha ne: ''Hêzên me saet 15.00'an li leşkerên dijmin ên li ser girê Lêlîkanê yê li herêma Bradostê ya Başûrê Kurdistanê xistin. Çalakî ji du baskan ve hate kirin û di encamê de 3 leşker hatin kuştin, yek jî birîndar bû.

Roja 21'ê Tîrmehê saet 17.00'an, hêzên me li Eyaleta Serhedê di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî de li dijî yekîneyeke dijmin a li nêzî qereqola gundê Nezokê yê navçeya Bazîd a Agiriyê çalakiyek pêk anîn. Derbên giran li yekîneya dijmin hate xistin û 2 leşker hatin kuştin, yek jî birîndar bû.

Di çaçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Delal Amed û Şehîdên Bestayê de hêzên me 21'ê Tîrmehê saet 19:15'an li dijî qereqola Guzeldere ya li navçeya Elbak a Wanê çalakiyek li dar xistin. Di vê çalakiyê de 2 leşker hatin kuştin, 2 jî birîndar bûn.''

## 15 kes ji ber germê mirin



Li Japonyayê, herî kêm 15 kes ji germê mirin û 12 hezar kes jî nexweş ketin.

Li gorî îdareya felaketên xwezayî, dawiya hefteyê 12 kes mirin û 9.900 jî ji ber nexweşiyê rakirin nexweşxaneyê. Hefteya bihurî jî 3 kes mirin û 2.700 kes rakirin nexweşxaneyê.

Roja Yekşemê li gelek bajaran pileya germê gihîşt 40 dereceyê. Li gorî ajansa nûçeyan a Kyodo Newsê, tenê roja Şemiyê 11 kes mirin ku piraniya wan kal û pîr in.

Ajansa meteorolojiyê ji ber germê hişyarî da. Li gorî daxuyaniyê, dinya wê gelekî germ bibe û ji welatiyan hate xwestin ku gelekî avê vexwin. Hefteya bihurî ji ber germê zarokekî 6 salî dema ji dibistanê derket, jiyana xwe ji dest dabû.

## HSM'ê buroya xwe li Hesekê vekir

Partiya Sûriya Pêşerojê bi aramanca berfirehkirina xebatên xwe, buroyek li bajarê Hesekê vekir.

Bi dehan şêniyên Hesekê, endamên saziyên sivîl, nûnerên partiyên siyasî û rûspiyên êlan beşdarî merasîma vekirina buroya Partiyê bûn.

Di marasîma vekirinê de Endama Rêveber a Buroya Partiya Sûriya Pêşerojê şaxê herêma Cizîrê Ranya Ferman axivî û vekirina buroyê li gelê Sûriyê pîroz kir û got : "avakirina Partiya Sûriya Pêşerojê bi dirûşma 'Avakirina Sûriyeke pirreng û ne navendî' ji bo bi cihanîna daxwazên şêniyên ku bi yekîtiya Sûriyê bawer in pêk hat. Gel ji hêza xwe bawer e ku dikare nûnertiya xwe bike û hemû biryarên ji bo çareseriya aloziya Sûriyê û afrandina Sûriyeke azad û demokratîk bigire. "

Ranya got : "Em amade ne ku bi hemû saziyên ku destek didin avakirina Sûriyeke demokratîk hevkariyê bikion."

Piştî axaftinan buro ji aliyê dayîkên Şehîdan ve hat vekirin.





# Encamnameya Komxebata Zanîngeha Rojava

***Komxebata "Zanîngehek Azad û Demokratîk" di roja duyemîn de bi dawî bû û encamnameya wê hat eşkerekirin. Di encamnameyê de li ser gelek xalên sereke ku zanîngeh pêk bîne û li gor wê xwe bi rêxistin bike hatin destnîşan kirin.***

Komxebata "Zanîngehek Azad û Demokratîk" di roja duyemîn de bi dawî bû û encamnameya wê hat eşkerekirin. Di encamnameyê de erka zanistî ku dikeve li ser zanîngeheke azad hat destnîşnkirin.

Encamnameya komxebatê ji aliyê xwendekarê zanîngehê Jiyan Mîrza ve hate xwendin.

Di encamnameyê de derbarê hin xalên sereke de wiha hat gotin, "Parastina civakê ku di bin pergala resmalî de bi qirkirine re rû bi rû ye. Ji bo em bikaribin civakbûyînê biparêzin nirxên ku bûne hêmanê civake rast tehlîl bikin. Tişteke li ser êrîş tê kirin rastiya civaka exleqî-polîtîk e. Erkê yekemîn ev e ku ev bê exlaqî û karên xirab ku bi hevkariya zanist û sulta tê kirin divê nebin şirîkê wê û rexne bikin.

Zanistê civakî xistina esasê hemû zanistan. Zanist û zanyarî çavkaniya xwe ji civake digirin. 'ema ku em di bingeha hemû zanistan de zanistên civakî datînîn gerek rexneyên li ser zanistên civakî jî di bala me de be. Jineolojî li ser zanebûn û tecrubeyên tevgerên azadîya jinan dikare bike zanisteke civakî bi nerîna jinê. Zanista civakî ya rast dema ku lêkolînên li ser têkilîyê jin û zilam li ser esasê hevjiyanê werin pêş xistin dikare gavên mezin bavêje.

Bi zanîngeh û akademîyek azad re em dikarin di zanistê de şorşek sazîbûyîneke çêbikin. Niha jî dîsa bi şoreşeke zanistî re pewistî heye. Di bin paradîgmaya modernîteya demokratîk de fikrên ku rexnê li pozîtivîzme dikin dikarin kom bikin.

Zanîngehek di aliyê rêvebirî zanistî û aborî de xweser rêgezek gerdûnî ye. Ger ev rêgez jiyanî nebin zanîngeh nakeve xizmeta civakê berovajî vê bibe amûrê deshîladariyê.




Di xweseriya zanîngehê de vekirina asoyên zanistî ya ku jiyana ekolojîk dipareze, li ser rêgeza azadiya jinê tevdigere, tevlêbûyîna demokratîk esas digire.

Perwerdeyeke azad gerek li ser rêgezên exlaq, pratîk, avakirina hêza çareseriya li gel xwendakaran bikaribe ava bike. Perwerde ne ku mejî bi agahiyan dagirtine. Gerek kesayet bizanibe wê çawa agahî binirxîne xwe bigihîne berheman û xwe bigihîne hunera lêkolînê. Beriya her tiştî pêwîst e zanîngeh ji hemû pêkhate, deng û rengê civakê re deriyê xwe vekirî be.

Di rêvebirina zanîngehê de navendgerî û hiyerarşiyeke hişk nebe. Bê guman bê otorîte jî hebe lê pêwîst e ew jî otorîteya demokratîk be. Karê hişmendî û zanistî encex di şert û mercên azad, ji desthilatdariyê dûr û herikbar de bi ser dikeve.

Di nava erkên zanîngehê de û bi taybet jî di rêveberiyê de pisporî, liyaqet an ku hêjayî, şiyan an ku qebiliyet û tekûzî pîvanên sereke bin.

Di Komxebata me de hate xuyakirin ku li ser mijarên zaningeheke azad hîn bêhtir nîqaş, lêkolîn û perwerde pewîst dike."

## Girîngiya vegotina çîrokan ji bo zarokan



**Derwêş M. FERHO**

Dema zarok tên dinyayê, jiyana li dor wan çi hebe, teşe, alav û tevger; rabûn û rûniştin, ziman, zanebûn û fikrên wan li gor van tiştan avadibin, teşe digirin. Bi axaftinê zimanê wan va dibin; bi vegotin ,ravekirin û dîtinê jî zanîna wan çêdibe.

Li gor hin zanayên pedagojiya zarokan, zarokên vê demê pir zana ne lê pirraniya wan li ber tv'yan an jî bi perwerdehiyê di bin kontrola mamoste û li gor rêgezan mezin dibin. Zanin û perwerdehî ne tiştên xerab in lê tv çî çîrokê vebêje dîmen jî pê re dide ji ber vê zarok bi xwe xeyal nakin, perwerde jî zarokan ji aliyê zanebûnê ve têdigihîne. Herçend e ev ji aliyê zanistiyê nehatiye îspatkirin jî, rastiyek tê de heye. A. Einstein dibêje " Xeyalkirin ji zanînê girîngtir e ji ber ku zanîn bi sînor e le xeyalkirin na" Einstein ne tenê agahî dide me, rê ji dide ber me û dibêje "Heke hun dixwazin zarokên we jîr bin ji wan re çîrokan vebêjin, heke hun dixwazin jîrtir bin hîn zêdetir çîrokan vebêjin" Vegotina çîrokan ne bes ji bo jîrbûnê baş e. Vegotina çîrokan:

- Zimanên zarokan pêş ve dibe û dewlemendtir dike,
- Ji aliyê bîrbûnê ve wan pêş ve dibe (famkirin û hifz),
- Zarok bi alikariya çîrokan bala xwe zêdetir li ser tiştekî didin hev,
- Têkiliyên wan û kesê çîrokbêj xurttir û germtir dike,
- Bi rêya van çîrokan cîhana dor xwe bi awayekî berdewamî nas dikin.

Gelek çîrokên modern hene û hin dikarin wan ji zarokên xwe re vebêjin. Lê heke hun dixwazin zarokên we li ser koka xwe şîn bibin çîrokên gelerî ji wan re vebêjin. Herçiqas di van çîrokan de hin hêmanên tirsê hebin jî netirsin, çîrokan li gor temenê wan, li gor famkirina wan adabte bikinû ji wan re vebêjin. Di aliyê din de herçiqas hêmanên tirsê bihewînin jî herî dawiyê her tim yên baş bi ser dikevin. Carinan leheng bi ser nekevin jî ev ji wan re dibe wek şîret. Bi alikariya van çîrokan zarok başî û nebaşiyê jî hîn dibin. Lehengên baş çawa tevdigerin û bi ser dikevin, têkevin binê bîrekê jî ev dibe destpêka jiyaneke nû û bi çalakî û jîrbûna leheng jiyana wî hîn xweştir dibe. Wek Gilbert K. Chesterton dibêje: "Çîrokên ji rastiyê wêdetir in; ne hebûna ejdarhayan vedibêjin lê pêkanbûna bibirîna (biserkeftina) ejderhayan vedibêjin".


Ya girîng ew e, dema çîrok ji wan re tê vegotin bi bawerî were gotin. Dema çîrok bê tirs were gotin, zarok jî natirsin. Bi vegotina awayê vegotinê, bawerî di zarokan de çêdibe.

Divê zarok ji rastiya jiyanê haydar bin, başî û nebaşiyê bibihîzin, hîn bibin.

Dema çîrok ji zarokan re tê gotin, ew xwe dikin şûna lehengên di çîrokê de. Çi astengiyên derdikeve pêşiya leheng, di xeyala zarokê de wek derkeve pêşiya wî/wê. Dema leheng ji astengiyan xelas dibe an pirsgirêkan çareser dike wek zarok bi xwe çareser bike tecrube dike.

Meriv carinan çîrokên berê ji zarokan re hatiye vegotin, bi wan bidin vegotin ku binerin zêdetir çi bala wan kişandî û çi di bîra wan de maye. Carinan çîrokên hun ji wan re vedibêjin ew di xeyalên xwe de piçekî diguherin. Ev jî dide nîşandin ku çi di binhişê zarok de heye, çi zêdetir bala wê/wî kişandiye. Ango bi vî awayî meriv zarokan jî dikarin baştir nas dike.


## Pêşengeh dê bibe bingeha avakkirina çanda xwendinê











**Melek DEMÎRTAŞ**

Di 2.pêşengehê de derdora 14 hezar pirtûk li bêşiya xweîneran hate raxistin di nav wande pirtûkên çandî, wêjeyî, civakî, siyasî û zanistî hatin pêşkêşkirin. Di pêşangehê de beşek taybet ji bo pirtûkên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan heye, her wiha pêşangeha wêneyên hêzên Asayîşê dê di her sê rojên dawî de werin pêşkêşkirin û beşek jî bi wêneyên xêzkirinê yên Weqfeya Jina Rewşenbîr jî heye. Ji çalakiyên pêşangehê dê semîner li ser rewşa çandî li Rojava, nivîskarên kurd ên ku bi zimanê erebî nivîsandine, helbesta şer li Rojava, jin di wêjeya şoreşê de dê werin dayîn."

Têkîldarê mijarê Rojnameya Ronahî nerînên beşdarvanan ser girîngî û tevlî bûn girt û diyar kirin dê mîna van pêşnghena bibe bingeha avakirina çanda xwendin û hêzdayîna pênûsan bi hemû cûreyan."

### 200 PİRÛKÊN CÛR BE CÛR TEVLÎ BÛ

Xwediyê Pirtûkxaneya Zehra Ebdilqadir Cuma diyar kir ku Jıber ku derng hatin vexwendin kêm hazrtî tevlî pêşengehê bûn û wiha got: "Em gelekî kêfxweşin ku derfetek wisa çêbû û tevlî bûn, em bi nêzî 200 pirtûk bi mijar û naverokên cûda wekî roman, çîrok, olî tevlîbûn. û wiha bi dawî kir: "Ev pêşengeh dê bibe bingeha avakirina çanda xwenedinê di civakê de."

### PÊŞENGEH DEN Û RENGÊ PÊNÛSAN Bİ HÊZ DİKE

Endamê Ofîsa Ragihandian MLSPB Azad Çayan jî wiha nerînê xwe anî ziman: "Ev cara yekemîne ku em beşddarê pêşengehê dibin, bi beşdarbûna hemû beşên rewşenbîrî û hunerî cihê şehnaziyê ye, ji ber ku berhemên şoreşê lê têne pêşkêşkirin. Û wiha dom kir: "Em wekî Ofîsa TAJKPC Di Rojava de bi 6 pirtkên bi naverokên xwe dispêre şoregerî, şervanî û taybet ya Mahîr çayan beşdarbûn. Ev pêşengeh piştgirtiya nivîskar û xwediyên pênûsan dike û wê jiwanre dibe bingeh hêzdayînê."

### TÊKOŞÎNA BERXWEDANA ŞERVANAN Bİ WÊNEYAN DÎROKÊ DİKE

Endamê ragihandina YPG'ê Reşo Kasan ji bajarê Dêrik bi 28 wêneyan beşdarî pêşengehê bû û diyar kir ku ev wêneyên ku kişandine yên berwxedaniya Şervanan taybet berwxedana serdemê ne û wiha pêde çû: "Ev cara yekemîne ku tevlî pêşengehê dibim, dibe ku bêjin wêne kişand lê, ez dibêjim her berxwedaniyê xde dîrokek hate kişand. Ji ber ku ew berwxedaniya ku li Efrînê hate kirin bi serê xwe dîroke, Jiber di van wêneyande hovştiya dewleta tirk a dagirker tên teysandin, her wiha di wêneyan de du rengê şer hene; şerê çek û hişmendiya kor tê diyar kirin."

Reşo bi hestên kişandê axaftina xwe bidawî kir:"Di kişandian her wêneyek hesteke, ku di hind wêneyên ku min kişandine pêre giriya me, ji bo wê jî her wêneyek wate û çîrokeke. Bi van wêneyan berxwedan û dîrokê zindî dikim. Bi hêvîme ku dîrok mîna berê neyê veşartin, pêwîste dîrok werê weşandin û herkes wê dîrokê nasbike û xwedî lê derkeve, her yek bi çek, kemêre, pênûs, deng û bi fotoyê dikare dîrokê binivîsîne."

### PÊŞENGEH MÎNA GULÎSTANEKÊ HEMÛ RENG Û ÇANDÊ HİMBÊZ KİR

Parêze Zahid Mehmûd wekî beşdarvan wiha nerînê got: "2.Pêşengeha Pirtûkan pîroz dikin û mîna van pêşengehan ji bo pêşxistina civakê di milê çand û ramyarî de girîne, di pêşengehê de hemû ren û çandên cûr becûr beşdarbûne û ev bi serê xwe serkeftine. Rastî du dîwanên min jî hene lê hîn di çapê dene, ev pêşengeh hêzda min ku di 3.Pêşengehê beşdar bibim. Ji bo pêşxistina asta ramyarî û rewşenbîrtî ev pêşengeh gavek dîrokîye."

### PÊŞENGEHA ÇANDA XWENDİNÊ Dİ CİVAKÊ DE AVABİKE

Rêvebira Navenda Şopdarên Rojê ya girêdayî çandê Heyva Heyder Hesen jî bi lêvkir: "ku Navenda wan di 1'ê meha Çile 2018'an de li bajarê Qamişlo hate vekirin û ev cara yekemîn di pêngehê bi sê pirtûkan beşdarbûn. Û Heyva wiha dom kir: "Pirtûka Şefeqa bi rûyêdin çîrokên şoreşê vedibêje Henan Reşko nivîsandiye, Serdaba Reş Ehmed Hemê ye naveroka wê ser DAIŞ û hovîtiya wan vedibêje û pirtûka sêyemîn jî Eyqona nemirî ji şoreşa kurdî ji berhemên Heyfa û Sena ne. Ev pirtûk bi taybet ser jinên kurd ji serdema mîsolojî û heya roja îro, ku jin di qda şer û civakê de jî pêşengtî û rêbertî kiriye vedibêje. Her wiha Ristem Resûl demografiya lêşkerî bi zimanê kurdî weşand. Ev pêşengeh wêbibe wesîleya hêzdayîna pênû û avakirina çanda xwendinê."

# Herêma pîşesaziyê ji nûve tê ava kirin

**_Herêma Pîşesaziyê ya Girkê Legê ku di nava taxan de cih digire û bûye cihê rê li ber nerazîbaûnê vedike. Li ser daxwazên pîşesazan û şêniyan wê cihê pîşesaziyê bê guhertin. Niha cihek nû hatiye dîtin û xebatên avakirinê dewam dikin._**



Şaredariya Gel a Girkê Legê dest bi projeya herêma pîşesaziyê (bajarê sînayî) kir. Dê di herêmê de 280 dikan werin çêkirin.
Herêma Pîşesaziyê ya Girkê Legê niha di nav taxan de cih digire û bûye cihê tengezarî û nerazîbûna şêniyên herêmê. Li ser daxwazên pîşesazan û şêniyan ji sala 2015'an ve dest bi nirxandina projeya veguhastina herêma pîşesaziyê ya derveyî bajêr kir. Lê ji ber nedîtina parçeyek erd, proje paşde hate xistin.
Piştî xebatên şaredariyê û bi hevkariya komîn û meclisan şaredarî parçeyek erd di navbera bajarê Girkê Legê û gundê Gir Ziyarat Cûlî yê li başûrê Girkê Legê de peyda kir.
Projeya avakirina bajarê pîşesaziyê li ser beşdariya pîşesazan hatiye avakirin. Mehane pîşesazan pereyên ku ji aliyê şaredariyê ve berê hatine eyarkirin didin û ev pere ji bo avakirina bajarê pîşesaziyê tê xerckirin.
Li gorî rayedarên şaredariyê, bajarê pîşesaziyê ku dest pê kiriye, 280 dikan û werşeyan dihewîne. Her wiha firehiya kolanên bajêr 25 metre ne û bilindahiya avahiyan 4 metre ye. Di bajêr de baxçeyek fireh li aliyê pêş ve û xetên kanalîzasyonê û xetên ava vexwarinê. Ceyran, telefon û înternet jî dê tê de hebin. Proje hê jî di asta destpêkê de ye. Niha werşeyek taybet dest bi kolandina bîrekê kiriye. Her wiha dest bi plankirina kolanên bajêr û kolandina xetên kanalîzasyonê kirine. Tê payîn ku dê xebatên avakirinê di çend mehan de bi dawî bibin.
Endamê Rêveber ê Komîteya Teknîkî ya Şaredariya Gel a Girkê Legê Şahîn Besrî diyar kir ku li gorî navçeya Girkê Legê projeya bajarê pîşesaziyê mezintirîn û girîngtirîn projeyan e û tekez kir ku bajarê pîşesaziyê ji aliyê xedemî ve dê were amadekirin…*ANHA*

# Rêyên Eyn Îsa hatin sererastkirin



Şaredariya Gel a Eyn Îsa kar û xebatên sererastkirina rêyên navçeyê bi dawî kirin. Şaredariyê 3 hezar û 555 metre rê qîr kir.
Şaredariya Gel a navçeya Eyn Îsa ji ber ku hemû rêyên navçeyê û deriyên têketin û derketina wê ji ber şerê çeteyên DAIŞ`ê xirab bûbûn, ev zêdetirî mehekê ye ku dest bi sererastkirinê kir.
Şaredariyê bi buhayê 40 milyon lîrayên Sûriyê, 3 hezar û 555 metre rê qîr kir.
Ji rêveberên Komîteya Fenî ya Eyn Îsa Osman Bozan da zanîn ku piştî plansaziyeke berfireh, wan rêyên Eyn Îsa sererast kirin. Bozan bi bîr xist ku kesên herî zêde ji xerabûna rê aciz bûn, ajokar bûn, bi qîrkirina rêyan re êdî çûn û hatin gelekî baş bûye û taybet ajokar di vî alî de kêfxweş in.
Bozan da zanîn ku ji ber kêm derfetiyan, wan xebatên sererastkirina rêyên gundên girêdayî navçeya Eyn Îsa taloqî dema pêş kir…*ANHA*

# Turnuvaya futbolê tê birêxistinkirin



Komîteya Ciwan û Werzîşê ya girêdayî Rêvberiya Sivîl a Demokratîk a herêma Tebqayê lîstikeke futbolê di navbera tîma El-Sed a Tebqayê û Tîma El-Şerîf a Minbicê de bi rêxistin kir.
Maç li stada Gaz a navenda bajarê Tebqayê hate lîstin. Bi dehan hezkiriyên herdu tîman temşeya maçê kirin.
Maç ji aliyê saziyên ragihandinê ve hate şopandin.
Endamê Rêveber ê Komîteya Ciwan û Werzîşê Mihemed El-Nair têkildarî mijarê got, "Ev maç wekî gava destpêk ya amadekariyên turnuveyeke futbolê li ser asta bakurê Firatê ye. Ji herêm û bajarokê Tebqa, Minbic, Reqa, Kobanê, Eyn Îsa û Girê Spî wê beşdarî turnuvayê bibin."
Di lîstikê de tîma El-Sed bi ser ket.
Tê payîn wê turnuvaya Bakurê Firatê di meha Tebaxê de were lidarxistin…*ANHA*

# YRA'yê li Minbicê civîn li dar xist



Hevserokê Yekitiya Ragihandina Azad di civîna xwe ya yekem de ku bi xebatkarên çapemeniyê yên Mibicê re li dar xist, armanca yekitiyê û erka dikeve ser milê xebatkarên çapemeniyê nirxandin.
Hevserokê Yekitiya Ragihandina Azad (YRA) Sîpan Can û endama Meclisa YRA'yê Şîlan Mihemed civîna ku li salona Meclisa Zagonsaz a Minbicê hate lidarxistin û piraniya xebatên çapemeniyê yên herêmê beşdarî wê bûn, bi rê ve bir.
Di civînê de hevserokê YRA'yê Sîpan Can axivî û bal kişand ser girîngiya avakirina YRA'yê û ev tişt anî ziman: "Di destpêka aloziya Sûriyê de me kongreya yekem a YRA'yê li dar xist. Hejmareke mezin ji xebatkarên çepemeniyê beşdarî wê bûn. Armanc bi vê yekê dagirtina valatiyê û birêxistinkirina xebatên çapemeniyê bû. Ji ber ku bi destpêkirina aloziya Sûriyê re gelek saziyên çapemeniyê hatin avakirin, lewma avakirina YRA'yê pêwîstiyek bû, da ku rewşên qanûnî werin parastin."
Di berdewama civînê de xebatkarên çepemeniyê pirsên xwe ji hevserokê YRA'yê kirin. Di dema bersivdayînê de nîqaş hatin kirin.
Di nava nîqaşan de behsa rewşa heyî hate kirin û rêziknameya hundirîn a YRA'yê hate şîrovekirin.
Yekitiya Ragihandina Azad di kongreya xwe ya çaran de ku li Qamişlo hate lidarxistin, gelek biryar derbarê pêşxistina xebatên YRA û firehkirina karê wê de dan. Di nava biryaran de vekirina şaxên YRA'yê li gelek herêmên rizgarkirî yên Bakurê Sûriyê heye.

# Şoreşa 19'ê Tîrmehê mîrateyên gel parast



Pêkhateyên herêma Cizîrê diyar kirin ku şoreşa Bakurê Sûriyê berdewama şoreşên berê ye û destnîşan kir ku gelên herêmê karîbûn hemû planên gemarî têk bibin.
Bi sedan şêniyên navçeya Amûdê tev li merasîma sersaxiyê ya şervanê YPG'ê Zana Hesen (Zagros Amûdê) bûn ku 17'ê Adarê di Berxwedana Serdemê de şehîd bûbû. Konê sersaxiyê li ber mala malbata şehîd hate vekirin.
Endamê Rêveber ê Meclisa Malbatên Şehîdan Seîd Ferso di merasîmê de axivî û diyar kir ku şêniyên Rojava erka xwe ya beranberî welatê xwe pêk anî û ji mirinê jiyan afirandin û destnîşan kir ku pêkhateyên Rojava bi saya têkoşîna şehîdan parastina destkeftiyên xwe kirin.Di merasîmê de her wiha endamê Fermandariya YPG'ê Reşîd Reşîd jî axivî û da zanîn ku şoreşa Rojava berdewama şoreşên berê ye û parastina mîrasên kevn ên şoreşê kiriye û wiha dewam kir: "Gelên herêmê bi têkoşîna xwe karîbûn hemû planên li dijî herêmê pêk hatine vala derxin. Şoreşa Rojava-Bakurê Sûriyê xwe nespart tu hêzên navdewletî lê belê bi saya şehîdên wekî Zagros û Hîwa îro welat hatine rizgarkirin û destkeftî hatine bidestxistin."Piştî axaftinan sicîla şehîd hate xwendin û radestî malbata şehîd Zagors Amûdê hate kirin.

# Li Reqayê pêngava paqijiyê dewam dike



Komîteya Paqijiyê ya girêdayî Şaredariya Gel a Reqayê û bi alîkariya Komîteya Jinûveavakirinê dest bi xebatên paqijkirina kolanan kir. Kirs û bermahiyên heyî têne rakirin û kuçe û kolan tên paqijkirin.
Meclisa Sivîl a Reqayê di 1'ê Tîrmeha derbasbûyî de dest bi xebatên paqijkirin û jinûveavakirina Reqayê kir.
Di heman demê de xebatên xizmetguzariyê jî dest pê kir. Di vê çarçoveyê de komîteyê dest bi xebatên paqijkirina bajar kir.
Serokê Komîteya Paqijiyê Esed El-Mustefa derbarê mijarê de diyar kir ku hemeleya wan wê 5 mehan dewam bike û da zanîn ku di vê demê de dê hemû bajar ji bermahî û sergoyê were paqijkirin…*ANHA*



# Jinên Sûriyê rê nîşanî jinên Rojhilatanavîn dan

**_Kongreya Dameziriîner a Rêxistina Jinan a PYD'ê bi dirûşma "Azadiya jinan mîsogeriya civaka exlaqî û siyasî ye" li Navenda Aram Tîgran a Çand û Hunerê ya bajarokê Rimêlanê hat lidarxistin. Bi sedan endamên jin ên PYD'ê yên Bakurê Sûriyê û Ewropayê beşdarî kongreyê bûn. Hevseroka PYD'ê Eyşe Hiso di kongreyê de axivî û diyar kir ku jinên Sûriyê bi têkoşîna xwe rê nîşanî hemû jinên rojhilatanavîn dan._**



Nûnerên şandeyên beşdarî Kongreya Damezirîner a Rêxistina Jinan a Partiya Yekitiya Demokratîk bûne, diyar kirin ew rola jinan di avakirina civakê de girîng dibînin.
Kongreya Damezirîner a Rêxistina Jinan a Partiya Yekitiya Demokratîk PYD'ê bi dirûşma "Azadiya jinan mîsogeriya civaka exlaqî û siyasî ye" li Navenda Aram Tîgran a Çand û Hunerê ya bajarokê Rimêlanê hat lidarxistin. Bi sedan endamên jin ên PYD'ê yên kantonên Rojava û Bakurê Sûriyê û jinên rêxistina PYD'ê ya Ewropayê beşdarî kongreyê bûn. Endamên rêxistina PYD'ê yên Başûrê Kurdistanê ji ber ku PDK'ê rê neda ku derbasî rojava bibin nikaribûn di beşdarî kongreyê bibin.

### JINÊN SÛRIYÊ RÊYA HEMÛ JINAN DIYAR KIRIN

Hevseroka PYD'ê Ayşe Hiso di kongreyê de axivî û diyar kir ku jinan di şoreşa Sûriyê de rêya rast nîşanî hemû jinên Rojhilata Navîn kirin. Ayşe destnîşan kir ku sîstema li Bakurê Sûriyê wê bibe mînaka çareseriya aloziya Sûriyê.
Ayişe Hiso destnîşan kir ku dewletên desthilatdar dixwazin jinan bikin amûr di destê xwe de û mafên wan binpê bikin û wiha got: "Şoreşa Rojava û birêxistinkirina jinan hişt ku jin bigihîjin asteke bilind di aliyê siyaset û leşkerî de. Jinan di şoreşa Sûriyê de rêya hemû jinên Rojhilata Navîn diyar kir."
Ayşe Hiso tekez kir ku sîstema li Bakurê Sûriyê wê bibe mînaka çareseriya aloziya Sûriyê û wiha got: "Ji destpêkê ve me gotiye ku bi diyalogê aloziya Sûriyê wê çaraser bibe. Hemû civînên mîna Cinev û Astana aloziya Sûriyê kûrtir kir."
Di kongreyê de li ser navê Meclisa Malbatên Şehîdan Lîna Yûsiv axivî û diyar kir ku jinan di şoreşa Rojava de îradeya xwe di hemû aliyên siyasî û leşkerî de îspat kir û got, "PYD'ê li ser rêya azadiya jinan û pêkanîna rêgeza neteweya demokratîk bi sedan şehîd dane."
Berdevka Kongreya Star Evîn Siwêd jî axivî û lidarxistina kongreyê û salvegera Şoreşa 19'ê Tîrmehê li hemû jinan pîroz kir.
Evîn Siwêd di axaftina xwe de damezirînera PYD'ê şehîd Şîlan Kobanê bi bîr anî û da zanîn ku niha hemû jinên Rojava li ser rêya şehîd Şîlan xebatên xwe didomînin û wiha got: "Xebatên jinan di xwebirêxistinkirinê de di nava PYD'ê de û avakirina wan ji meclisên xwe re û pêkanîna sîstema hevserokatiyê serfiraziyeke mezin e."
Di kongreyê de li ser navê Koordînasyona Jinan a Rêveberiya Xweseriya Demokratîk şêwirmenda rêveberiyê Mizgîn Ehmed axivî û wiha got: "Kongre di rewşeke hesas de tê lidarxistin ku di heman demê de çareserkirina aloziya Sûriyê tê nîqaşkirin. Ji ber vê yekê lidarxistina kongreyê gelekî girîng e."
Mizgîn Ehmed di berdewama axaftina xwe de diyar kir ku PYD'ê girîngiyeke mezin daye rola jinan di avakirina civakê de û wiha dewam kir, "Tevî ku em niha di serdemeke şer de dijîn û ji ber sîstemên desthilatdar tecrubeya jinan tune ye û di şoreşê de kedeke mezin ber bi wergirtina azadiya xwe ve daye. Emê di hemû aliyan de xwe bi rêxistin bikin. Em ê di vê serdemê de jî bi hemû hêz û derfetên xwe têkoşîna xwe berdewam bikin û em ê dengê xwe bigihînin hemû jinên cîhanê û hevgirtina xwe xurt bikin."

# Dayîka Sultan dildara têkoşîna azadiyê ye

Siltan Hisên a ku bi salan e ji bo têkoşîna doza Kurd liberxwe dide û dildarê têkoşîna doza xwe ye anî ziman ku ji bo azadî û siberoja gelê Kurd ew ê berxwedana xwe bidomîne.
Jina Kurd a bi navê Siltan Hisên derbarê têkoşîna Tevgera Azadiya Kurd de diyar kir ku ew ê heta dawî têkoşîna xwe bidomîne.
Siltan Hisên bandora Tevgera Azadiya Kurd a li ser wê wiha rave dike: "Di destpêkê de hevala Salîha hat mala me, zarokên min ji min re gotin ev hevalek ji Tevgera Azadiya Kurd e. Piştî ku lawê min wiha got ez gelekî di bin bandora wê de mam û min alîkariya xwe ya ji bo tevgerê hîn zêdetir kir. Wateyek cuda li jiyana min hat barkirin."
Dayika Siltanê anî ziman ku ew bi rengekî fermî tevlî nava Tevgera Azadiyê bûye û wiha dewam kir: "Me wekî malbatî ji dil û can xebat dikirin. Şeş lawên min jî tevlî kar û xebatên Tevgera Azadiyê bûn. Ez bajar bi bajar geriyam gelek dijwarî min kişand lê min dev ji xizmeta ji bo Tevgera Azadiyê berneda."
Dayika Siltanê çûyina xwe ya li gel Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan jî wiha vegot: "Ez sê caran çûm cem Rêber Apo. Cara yekemîn li Libnanê min ew dît û herdu carên din jî, min ew li Şamê dît. Dema ku min serok dît ez gelekî bi kelecan bûm. Min ji xwe re got, ger ku serok bipirse, ez ê çawa bersiva wî bidim. Ji ber ku bi heybeta xwe ewqas bandor li ser mirovan dikir. Di warê hêza ji bo Tevgera Azadiyê min gelek feyz ji Rêber Apo girt."



Dayika Siltanê diyar kir ku xebat û xizmeta wê ya ji bo Tevgera Azadiyê didome û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Niha jî ez karê Rêveberiya Lijneya Silhê dikim û endama Saziya Malbatên Şehîdan im. Ji bo ez zimanê xwe pêş bixim jî ez dixebitim. Ez tu carî dev ji xebatê bernadim. Em bi keda xwe ya ji bo welatê xwe û Tevgera Azadiyê serbilind in. Em ê heta dawî li dû şopa şehîdên xwe bin. Em ji tiştekî natirsin û em ê heta dawî dev ji doza xwe bernedin."…

*Şêrîn Zêrevan / Qamişlo*

# Dagirker bi her awayî zilmê dikin



Malbatên ku ji bo parastina malên xwe li Efrînê man piştî zordestiyên leşker û çeteyan berê xwe dan Şehbayê.
Malbatên ku li Efrînê mabûn û ji ber zilm û zordestiyên çeteyên dagirker ku niha derbasî Şehbayê bûne diyar kirin ku her roj malên wan dihatin dizîn û zilm li wan dihat kirin.
Jina bi navê Naziliye Hemo ya 56 salî a ji Gundê Beradê ya Navçeya Şêrewa ye anî ziman ku wan bi zorê canê xwe xelas kirine û got: "Çete û leşkerên tirk bi her cureyên hovîtiyê êrîşî me dikirin. Malên me talan dikirin û xewên şevan li me diherimandin. Gel bi zilimê re rû bi rû diman, nikaribûn ji malên xwe derketana. Kesên ku li dijî wan derdiket qetil dikirin. Dest dirêjî jinan dikirin û jin bi tirs dijiyan. Dihatin diketin malên me jin, mêr û zarok dibirin. Ji me re digotin hûn YPG/YPJ ne û hemû tiştên me talan dikirin. Me canê xwe bi zorê xelas kir û niha em derbasî Şehbayê bûn."
Meziyet Oso ya 60 salî diyar kir ku ew jî ji zilmê reviyane û got: "Li Efrînê çete û leşkerên tirk gelek zilm li me dikirin. Li Gundê Beradê genimê ku gel çandibûn agir pê xistin. Çete zeviyên welatiyan dişewitînin. Di heman demê de malên me û çiya jî dişewitandin. Kes nikare tehemulî zilma wan bike. Jinek bi îşkenceyê kuştin. Darên zeytûnan şewitandin."
Her wiha jina bi navê Zefet Oso ya 40 salî jî wiha got: "Em her dem di mala xwe de bûn em ji tirsa çeteyan nikaribûn derketan. Tenê rojekê zaroka min derket derve ew jî çeteyan ew girtin. Dihatin malên me cil û erzaqên me didizîn. Wekî jin me gelek êş ji destên çeteyan kişand. Diketin malên gel û malên gel talan dikirin. Lê ez di wê baweriyê de me ku Efrînê ji çeteyan rizgar bibe û em ê vegerin ser axa xwe."…

*ROJNEWS*

# KJAR dixwaze hemû jinên Îranê vehewîne



Endama Koordînasyona KJAR'ê Peyman Viyan pirsgirêka jinê ya li Îranê nirxand û diyar kir, sîstema dewleta Îranê bi polîtîkayên xwe yên dijberiya li jinê, civakê dixe nava kaosê.
Endama Koordînasyona Civaka Jinên Azad a Rojhilatê Kurdistanê (KJAR) Peyman Viyan, komkujiya jinan li Îranê û sedemên wê nirxand. Viyan diyar kir ku ew kuştina jinan weke komkujiya jinan pênase dikin û got, "Ji ber ku di asta komkujiyê de jin têne kuştin. Bêguman gelek sedemên van komkujiyan hene. Îran niha hem ji aliyê aborî, hem jî ji aliyê siyasî ve di nava krîze giran de ye. Ev yek bandoreke giran li civakê dike. Dewlet ji her alî ve civakê dixe nava aloziyê. Bêguman ev yek herî zêde bandorê li jinan dike. Zexta li jinê tê kirin dema dawî zêde dibe. Îran yek ji wan welatan e ku zayendîperestî gelekî lê zêde ye. Yek ji sedemên zêdebûna şîdeta li jinê jî zayendîperestî ye. Sedema bingehîn a komkujiyên li jinan tê kirin, kûrbûna zayendîperestiya civakî ye. Sîstemeke giran a baviksalariyê heye. Zîhniyeta serdest a mêr naxwaze bêhn bê ber jinê. Dixwaze şîdetê bixe mejiyê civakê."
Peyman Viyan işaret bi feraset û têkoşîna KJAR'ê kir û got, "KJAR sîstemeke ku ne tenê jinên Kurd, lê dixwaze hemû jinên li Îranê di nava xwe de vehewîne. Dixwaze xwe bigihîne hemû jinên li Îranê, li dijî êrîşan wan biparêze. Em vê yekê ji bo xwe weke pîvanekê dibînin. Pirsgirêkên jinan hevpar in. Lewma divê projeyên me yên azadiyê û têkoşîna me jî hevpar bin. Di vê mijarê de plan û projeyên me hene. Em ê projeya xwe ya çareseriyê paşê bi jinên Îranê re parve bikn."…*ANF*

# Pêwîste em beşdarî danîna destûrê bibin

***Hêzên Siyasî yên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk û MSD'ê derbarê îdiayên danûstaninên bi rêjîmê re û destûra nû de daxuyaniyek dan. Di daxuyaniyê de wiha hat gotin, "Heta niha ti hevdîtin pêk nehatine. Îdiayên ku tên kirin bi armanca derxistina tevliheviyê ye." Hêzên siyasî dan zanîn ku yên teror li Sûriyê têk biriye mafê wane ku beşdarî danîna destûreke nû bibin.***




Hêzên Siyasî yên Saziyên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk û MSD'ê destnîşan kirin ku heta niha tu danûstandinên wan bi rêjîma Sûriyê re çênebûne û diyar ku îdayên têne kirin, bi armanca derxistina tevliheviyê di navbera gelê Bakurê Sûriyê de pêk tê û destnîşan kirin ku hêzên teror têk birin, mafê wan e ku beşdarî amadekariya destûrê bibin.

Hêzên siyasî yên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk û Meclisa Sûriya Demokratîk MSD'ê der barê mijarê de daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de ev tişt hate gotin: "Ji destpêka aloziya Sûriyê ve û bi rihê berpirsyariya netewî ya dikeve ser milê me, wekî hêzên siyasî yên Bakurê Sûriyê, me gelek insîyatîf û nexşerê ji bo bidawîkirina aloziyê pêşkêş kirin. Lê rêjîma Sûriyê û opozîsyona derve bi înada xwe û hevgirtina xwe ya bi hêzên derve re ku piştgiriya xwe ji wan girtine û bikaranîna çekan bû sedema kûrbûna aloziyê. Ev yek jî bû sedema ku kareseta mirovî bi serê gelê Sûriyê de were. Ev yek bû sedema ku binesaziya herêmê were rûxandin û derî ji çeteyên wekî DAIŞ, Nusra û gelek komên din ên tundrew re were vekirin. Sûriye bi vê yekê bû meydana şerê hêzên herêmî û navdewletî.

Bi baweriya me ku çareseriya siyasî tekane rêya bidawîkirina aloziyê ye, piştgiriya me ji hemû insiyatîfên navdewletî re û di serî de daxuyaniya Cinêv-1, Biryara Konseya Ewlekariyê-2254 û hemû biryarên girêdayî aloziya Sûriyê hebû. Tevî heta niha em ji wan civînan hatin dûrxistin, ji rihê berpirsyariyê ya bilind û ji bo bidawîkirina aloziya ku gelekî kûr bûye, me ragihand ku em ji hemû xebatên danûstandinan ên ji bo çareseriya siyasî re amade ne.

Ji ber çareseriya siyasî bê Danûstendina Niştimanî ya Sûrî-Sûrî ya bi sponsoriya navdewletî, wê pêk neyê. Ew tekane rêya çareseriya aloziya heyî ye. Hêzên rêjîma Sûriyê û ragihandina wan ev ragihandin û însiyatîfa me ya heyî bi derxistina îdiayan bi kar anîn. Ji bo vê yekê hin mijar bi zanebûn xistin rojevê û gotin ku bi Rêveberiya Xweser a Demokratîk re li hev kiriye. Rêjîm bi vê yekê dixwaze tevliheviyê di nav gelê me yê Bakurê Sûriyê de derxe û baweriya gel a bi rêveberiyê lewaz bike.

Em hêzên siyasî yên di damezirandina Rêveberiya Xweser de cih girt û Meclisa Sûriya Demokratîk tekez dikin ku heta vê kêliyê bi rêjîma Sûriyê re tu danûstandin pêk nehatine, tişta tê belavkirin jî ji rastiyê dûr e. Lê di heman demê de em ji dansûtandinan bi hemû aliyê Sûriyê ji bo çareseriyê û bidawîkirina aloziya heyî û avakirina Sûriya demokratîk a nenavendî re amade ne.

Di heman demê de em ji Neteweyên Yekbûyî û hikumetên bibandor ku rola wan di bidawîkirina aloziya Sûriyê de hebe û bi taybet Amerîka û Rûsya daxwaz dikin ku rola xwe pêk bînin."

## Em ji projeya Sûriya demokratîk venagerin



Sûriyê re vekirî ne û em dev ji projeya avakirina Sûriyeke demokratîk û nenavendî bernadin." Endamê Desteya Serokatiya Meclisa Sûriya Demokratîk Hikmet Hebîb di bin konê sersaxiyê yê pismamê xwe yê endamê Hêzên Ewlehiya Hundirîn Mihemed Selmo ku di 20`ê Tîrmehê de dema ku bi erka xwe ya leşkerî radibû şehîd ket de axivî û diyar kir ku ew li ser rêya şehîdên azadiyê ne.

Hikmet El-Hebîb eşkere kir ku divê kes guhê xwe nede reklamên ku kesên dixwazin deskeftiyên gelên heremê têk bibin.

Di bin konê sersaxiya pismamê xwe de Hikmet Hebîb axivî û diyar kir ku ew ji bo pêşeroja Sûriyê ji dan û standinan û lidarxistina kongreya netewî re amade ne. Hebîb wiha got: "Destên me ji bo çareseriyê ji

Hikmet Hebîb diyar kir ku Meclisa Sûriya Demokratîk ji dan û standinan û lidarxistina kongreyeke neteweyî ji bo Sûriyê amade ye û got, "Ev yek nahêle em dev ji projeya xwe ya Sûriya demokratîk, federal û nenavendî berdin."

Li ser helwesta rêjîma Sûriyê û aloziya Sûriyê jî Hebîb da zanîn ku rêjîma Sûriyê heta niha jî naxwaze aloziya Sûriyê bi rengê aştiyane bê çareserkirin.

Hikmet Hebîb da zanîn ku Sûriye ne ya kesayetekê ye lê belê ya gelê Sûriyê bi tevahî ye û wiha berdewam kir: "Pêwîste gelên herêmê piştgiriya hev bikin, ji ber ku tu tişt di dest me de tune ye ji bilî yekgirtinê. Lê me bi yekgirtina xwe gelek gav avêtin bi saya xwîna şehîdên xort û jin ên ku giyanê xwe di ber me de kirin qurban û dijminê herî mezin di cîhanê de qewitandin."

Endamê Desteya Serokatiya Meclisa Sûriya Demokratîk Hikmet Hebîb destnîşan kir ku projeya Sûriya nenavendî armanca wan a sereke ye û beramberî her tiştî ji ser danakevin û got: "Gelek hêzan bi me re da û stand da ku em Sûriyê ji rûxandinê xelas bikin."…*ANHA*

## Armanca HSM'ê Sûriyeke pir-reng e

Partiya Sûriyê ya Pêşerojê bi armanca danasîn û nirxandina armancên partiya xwe û helwestên wan li hemberî aloziya Sûriyê ji rewşenbîrên Hesekê re civînek li dar xist.Civîn li Salona Erd El-Ehlam a bajarê Hesekê hate lidarixstin. Bi dehan rewşenbîr beşdarî civînê bûn. Her wiha serokê partiyê nirxandin li ser rewşa dawîn li herêmê kir. Serokê partiyê Îbrahîm El-Qeftan axivî û partiya xwe da nasandin. El-Qeftan destnîşan kir ku armanca partiya wan avakirina Sûriyeke pirreng e û hemû pêkhateyan di nava xwe de bigire, ji pîvana hevpeyvîna di navbera partî û rêxistinan de bikarin aloziya Sûriyê ku ev 7 sal e dewam dike, çareser bikin.Qeftan tekez kir ku aloziya Sûriyê bi rêya şêwir û parastina yekitiya xaka Sûriyê wê were çareserkirin. Qeftan destnîşan kir ku destwerdana derve aloziya Sûriyê kûrtir dike. Di dawiya civînê de nîqaş li ser avakirina nifşekî nû û avakirina Sûriyeke pirreng û nenavendî nîqaş hatin kirin…



## Partiya rast a muxalif HDP ye

Hevserokê Giştî yê HDP'ê Sezaî Temellî, diyar kir HDP wê hemû mûxalifeta xwe nexe parlamentoyê û got: "Berevajî, emê li tevahiya Tirkiyê mafê xwe biparêzin, têkoşîna xwe ya aştî û demokrasiyê mezin bikin û em ê muxalifetê li hemû qadan bihûn in."

Kampa HDP'ê ya Wanê ku ji bo diyarkirina polîtîka û têkoşîna HDP'ê ya dema nû, bi beşdariya hevserok û hemû parlamenteran tê lidarxistin, di roja 3'yemîn de berdewam dike. Hevserokê HDP'ê Sezaî Temellî ku beşdarî kampê bû têkilarî mijarên di rojevê de nirxandinên girîng kir. Temellî diyar kir ku nav û penasekirina pergala ku piştî Hilbijartina 24'ê Hezîranê ketiye meriyetê ne diyar e û wiha got: "Ji ber vê ne diyarbûnê rewşeke ku welatê nikare bi rê ve biçe, li holê heye. Navê vê rewşê jî krîza rêveberiya welat e."

Temelî da zanîn ku pergala hatiye avakirin eleqeya xwe bi siyaseta Tirkiyê re tune ye got: "Pergala hatiye avakirin berhema zihneyeteke tekparêz e. Ji ber vê yekê niha Tirkiye di krîza rêveberî, siyasî, civakî de ye.

Temellî, di dewama axaftina xwe de wiha got: "Desthildarî ji



Meclîsê reviya. Yanî rêveberî ji derveyî Meclîsê avakirin. Hemû derdê wan ewbû ji Meclîsê birevin û Meclîsê bêwate û bênirx bihêlin. Bêguman HDP wê hemû mûxalifeta xwe neke parlamentoyê. Berevajî, wê li tevahiya Tirkiyê mafê xwe biparêze, têkoşîna xwe ya aştî û demokrasiyê mezin bike û em ê muxalifetê di vir de bihûnin.

Temellî, da zanîn ku tekane hêza muxalîf a li dijî desthilatdariyê HDP ye û got: "Partiya muxalîf a rast emin. Ji ber ku li Tirkiyê du alternafît hene. Yek feraseta tekparêz û rejîma yekzilamiye û ya duyan jî feraseta demokrasiya radîkal a HDP'ê ye. Siyaseta Tirkiyeyê dinavbera van her duyan de teşe digire. Ji ber vê yekê desthilatdar evqasî êrîşî HDP'ê dike, û hewl didin wekîlên HDP'ê terorîze bike.



## Qasî Tirk û Rûsan li Efrîn tawanbarin

Ezîz KOYLUOGLU

Di navbera dewletên li ser Sûriyê de hevdîtin û dialiyan de jî, lihevhatin didomin. Rûsya û Emerîka serkêşiya ev siyasetan dikin. Bi hatin ser desthilatiya Trump Emerîka dixwaze êdî ne wek siyaseta dema <Şerê Sar> tevbigere. Ev diheman demê de tê wateya wek tê gotin ne dostên berê êdî dostên ne dijmênên berê êdî dijminin. Ji bo wê jî her hêz ligora guhertina heye dixwaze xwe ji nûve bicih bike. Lê ev nayê wateya ev hêzan tiştên baş dikin, yan jî wê bikin. Jixwe heta niha yê dibin kurbana nakokî û lihevkirina wan hêzan dîsan gelên rebenin. Bitaybet diçend salên dawî de Rûsya wek hêzekî sereke li Sûriyê siyaset dike, him diguhertina demografiya heremê, him jî dikuştinên sivîlan de tewanên mezin kir.

Siyaseta Rûsya ya liser Sûriyê ye liser esasê bikaranînê ne. Sûriyê kiriye bazarek mezin ji bo berjewendiyê xwe yên cihanî pêkbîne. Jibo wê hemû rêbazan ji bo xwe rewa dibîne. Ger bixwaze dikare bihezaran bombe liser sivîlan dibarîne, ger bixwaze bihezaran mirovan cih û warê wan dike. Ev siyaseta kuştin û koçberkirinê jî, liser esasê çareseriyê dike. Lê ev çareseriya kêye? Mîsoger ne ya gelên rebene.

Rûsya dema bihêza xwe ya leşkerî derbasî Sûriyê bû, wiha hêzirdikir ku wê didemek kêm de encam bigre. Jixwe daxuyaniyên rayadarên Rûsan jî didestpêka ketina wan nava Sûriyê de jî, ev eşkere dikir. Lê ev nebû. Ji bo vê Rûsan li Sûriyê siyaseta xwe guhert. Siyasetek pirralî xist meriyetê. Despêkê dewletên li ser Sûriyê destek didin siyaseta leşkerî, bidijberê wan re tirsand. Ev siyaset him di dewleta Tirk ya dagirker de, him jî di Îsraîl de encam girt. Rûsya tirsa dewleta Tirk ya Kurdan pirr baş bikaranî, Tirkan kişand binsiyaseta xwe. Dîsan tirsa Îsraîl ya Îran jibo Îsraîl bikşîne nava siyaseta wek amûrek bikaranî. Ev siyaseta Rûsan yek civînên Astana bixwere anî û diencam de <Heremê Agirbestê> hatin tevgerkirin. Herêmên agirbestê ku ji başûrê Sûriyê, herêma Idlib, derdorî Şam, û başûrê bajarê Hema pêkdihat wek şêwazek şerê taybet kete meriyetê. Dewleta Rûs bivî şêwazî dewletên li ser Sûriyê siyaset dikirin û dixwestên ligora berjewendiyê wan desthilatî bidestbixin, bêbandorkir.

Rûsya ji dewleta Tirk re wek bertil Efrîn xist rojevê. Û ji Îsraîl jî got tu dikarî dinava Sûriyê li Îran bidî. Jixwe ev dewletan jî hinek jî bivê mebestê liser Sûriyê siyaset dikirin û alîkariya komên çeteyan dikirin. Ev siyaseta Rûsan encam girt. Û perçebûnek mezin xist nava komên çekdar û wan jihevxist. Didestpêkê li başûrê Hema û piştre jî Xuta Şerqî ev du herêmên agirbestê ji destê komên çeteyan derxist. Wek hêvî jî Idlîb ji bo çeteyên li wan herêman asê mane destnîşankir. Di vê de rola dewleta Tirk ya dagirker serekebû. Herî herêma sêyemîn ya agirbestê başûrê Sûriyê bilihevhatin û tirsandina kuştinê jinavbir. Xuya bû ku Rûsan biarmanca jinavbirana komên çeteyan ev siyaseta herêmên agirbestê xistiye meriyetê. Niha yek heremekî agirbestê mayî ye, Ev jî Idlib e.

Ev siyaseta Rûsan ya koçberî, kuştin, talanê zêdekir, bitaybet liser gelên Efrînê pêktê, nejêpar e. Di dagirkeriya dewleta Tirk ya ser Efrînê ku bi sedan ciwanên Kurd û Ereb jiyana xwe jidestdan, bi sedan sivîl hatin qetilkirin, di vê de qasî rola dewleta Tirk, rola Rûsan jî serekeye. Ev çar mehên dagikeriya dewleta Tirk ya ser Efrîn de rojane kuştin, tecavûz, îşkence, talana heye beşek ji tewambarê ev sûcan dewleta Rûs e. Rûs aktorê sereke yê guhertina demografîk ya li ser Sûriyê ne diheman demê. Îro ger bi deh hezaran kes ji Deraa, Şam, Hema, Himûs, Heleb bi zorê hatine Iblib û Efrîn, ew jî encamê siyaseta Rûsan e. Rûsya ger bixwaze pêşerojek aram ji bo Sûriyê tevger bike, dibe destpêkê jiber siyaseta xwe ya li Efrînê û encamê wê lêborînê ji Kurdan re bixwaze. Ya na wê di dîrokê wek şirîkê komkujiyên li Efrînê be.



# Hovîtiya dewleta Tirk a li Efrînê vegot

***Dewleta Tirk û komên xwe yên çete li Efrînê bi her awayî kiryarên der mirovahî li dijî welatiyên Efrînê didomînin. Ciwanekî Efrînî ku xwe ji dagirkerên Tirk rizgar kir, qala hovîtiya dewleta Tirk kir û got, "Leşkerên dewleta Tirk, çete û ENKS bi hev re tevdigerin. Li nava gundan digerin û êşkenceyê li welatiyan dikin."***




Ciwanekî Efrînî ku xwe ji dagirkerên Tirk rizgar kir, qala hovîtiya dewleta Tirk kir. M.Q. da zanin ku êşkence li zarokên 12 salî jî dikirin û diyar kir ku ji bo karibin li Tirkiyê di hilbijartinê de dengê xwe bidin, nasname ji kesên li Efrînê re çêkirine.

Dewleta Tirk a dagirker ku tevî komên xwe yên çete roja 20'ê Çileyê dest bi dagirkirina Efrînê kir, ji revandin û kuştina mirovan heta talankirinê, bi her awayî sûcên şer dike.

Ciwanê bi navê M.Q. ku di dema dagirkeriyê de nekarî ji gundê xwe derkeve û piştî çend mehan xwe rizgar kir, qala sûcên li dijî mirovahiyê yê dewleta Tirk kir.

### KURÊ META MIN HÎN JÎ WINDA YE

M.Q. diyar kir ku dema çete ketin gundê Keferşînê ew li wir bûn û got, "Em nikarîbûn derkevin. Piştre hatim Efrînê. 40 rojan li wir mam. Dûre nekarî vegerim. Ji ber ku gotin, ku li min digerin. Wêneyê min li ser Facebookê belav kiribûn. Êşkence li xizmekî min kirin. Ji bo cihê min bêje. Ji ber ku cihê min ji wan re negot, ew revandin. Em nizanin bê niha li ku ye. Li Efrînê timî êşkenceyê li mirovan dikin. Dikevin nava malan û li mirovan didin. Diçin kîjan malê, ji mirovên li wê malê re dibêjin 'te bi rêxistin kir' û êşkenceyê dikin. Ji bo wan ferq nake bê nêzî rêxistinê ye yan na. Hemûyan bi heman sedemê didin. Êşkenceyê li zarokên 12 salî jî dikin. Ne xema wan e bê zarok e ya jî extiyar e. Êşkenceyê li hemûyan dikin. Zêdeyî 20 kes li taxa me girtin. Hevalê min girtin. Hevsera wî mamoste bû. Hevsera wî reviya, lê hevalê min di destê wan de ye. Gelek çete ketibûn nava gundê me. Min nema dikarî îrade bikim. Mi got, 'çi dibe bila bibe, em bimirim jî ez ê derkevim."

### JI BO HILBIJARTINÊ NASNAME ÇÊKIRIN

M.Q. anî ziman ku dewleta Tirk û çeteyên wê dest datînin ser erd û zeviyên gel û bi kirê didn xwediyê wan.

M.Q. got, "Dewleta Tirk ji gelê li wir re got, 'em ê nasnameyê bidin we, hem ji bo li nava Efrînê bi rehetî bigerin, hem jî li welatên din'. Ji hemû mirovên li wir re nasname çêkirin. Lê belê piştre di dema hilbijartinên Tirkiyeyê de bi wan nasnameyan deng dan bikaranîn. Derkete holê ku armanc ji çêkirina nasnameyan dayina dengan bû. Hin malbatên li Efrînê niha bê mal in. Hin malbatên li gundê me hene, tevî ku malên wan hebûn jî niha bê mal in. Wekî din erd û zeviyên welatiyan bi kirê didin welatiyan."

### ÇETE Û ENKS BI HEV RE TEVDIGERIN

M.Q. destnîşan kir ku çete û ENKS bi hev re tevdigerin, sûc dikin û got, "Li hin gundan mirovan ji bo xwe didin xebitandin. Dema mirov naxwazin bixebitin êşkenceyê li wan dikin. Leşkerên dewleta Tirk, çete û ENKS bi hev re tevdigerin. Li nava gundan digerin."

## Armanca sereke rizgarkirina Efrînê ye



Endamên Konferansa Rizgarkirina Efrînê di 2 civînên cuda de diyar kirin ku armanca wan rizgarkirina Efrînê ye.

Endamên Konferansa Rizgarkirina Efrînê li navçeya Şêrawa ya herêma Efrînê bi armanca nirxandina lêhûrbûn û biryarên konferansê 2 civîn li dar xistin.

Endamên Konferansa Rizgarkirina Efrînê li gundên Bênê û Aqîbê yên girêdayî navçeya Şêrawa ya Efrînê bi armanca nirxandina lêhûrbûn û biryarên ku di konferansê de hatine girtin û ji bo ku li welatiyan guhdar bikin, 2 civînên cuda li dar xistin. Bi sedan şêniyên Efrînê tev li civînê bûn. Di her du civînan de encamnameya konferansa rizgarkirina Efrînê hate xwendin.

Endamekî konferansê axivî û destnîşan kir ku êrîşên li ser Efrînê hemû bi alîkariya dewletên navneteweyî û di serî de Rûsyayê ku derfet da Tirkiyê êrîşên hewayî pêk bîne, pêk hatin.

Hat destnîşan kirin ku şêniyên Efrînê 58 rojan tevî şervanên YPJ/YPG`ê li hemberî artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê li ber xwe dan û heta niha jî berxwedana xwe li herêma Şehbayê didomînin.

Di axaftinan de hate gotin ku armanca dewleta tirk a dagirker tunekirina nasnameya kurdî ye û bi vê armancê komkujiyan li dijî kurdan pêk tîne.

Endaman di civînê de hemû lêhûrbûnên Konferansa Rizgarkirina Efrînê û girîngiya lehengiya şênî û şervanên YPJ/YPG`ê nirxandin.

Endaman kêmasiyên di saziyên rêveberiyê yên sivîl û leşkerî de ku li Efrînê derketin nirxandin û diyar kirin ku armanca konferansê ya sereke rizgarkirina Efrînê ye.

Şêniyan jî diyar kir ku ew ji bo rizgarkirina Efrînê amade ne da ku di demeke nêz de li warê xwe vegerin… *ANHA*

## Îsraîlê 800 'Kumspî' veguhestin Urdunê



Artêşa Îsraîlê, 800 endamên rêxistina 'alîkariyê' ya bi navê 'Kumspî' ku li Sûriyeyê li herêmên di bin serweriya komên çekdar de dixebitin, li gel malbatên wan veguhestin Urdunê.

Li gorî artêşa Îsraîlê, piştî ku hêzên rejîma Sûriyê ber bi başûrê welêt ve pêşve çûn, Kumspiyên li wan herêman xebat dimeşandin, hatin veguhestin. Hat gotin ku ev operasyona veguhestinê, bi daxwaza DYA û welatên Ewrûpayê pêk hatiye.

Hate ragihandin ku rêveberiya Urdunê, van Sûriyeyiyên bi navê Kumspî tên zanîn, wê bişîne weletên mîna Elmanya, Îngilîstan û Kanadayê.

Ev rêxistina bi navê Kumspî tê zanîn, bi taybetî 'bi pisporiya xwe ya derxistina kesên di bin kavil û xirbeyan de mayî dihatin nasîn.'

Kumspiyên ku li qadên di bin serweriya komên çekdar û komên sûcên giran ên şer dikin de xebat dimeşînin, li gorî artêşa Îsraîlê di bin gefa ku ji hêla rejîmê ve bên kuştin û girtin de ne.Li ser mijarê artêşa Îsaîlê got, "Ev nêzikatiyeke awarte ya mirovî ye. Îsraîl, hê jî xwedî wê polîtîkayê ye ku tevlî şerê li Sûriyê nebe û berpirsyarê vî şerê ku li ser xaka Sûriyê pêk tê, rejîma Sûriyê bi xwe ye."

Kumspî, gelek caran bi hevkariya komên çete hate sûcdarkirin. Heman kes dîsa bi sûcdariya ku destwerdana hêzên Ewrûpayî ya li ser xaka Sûriyê rewa nîşan bidin û vê amade bikin, lîstokên weke 'êrîşa çekên kîmyewî hat kirin' hatin sûcdarkirin.

## Şerê li Îranê wê giran be

Serokkomarê Îranê Hesen Rûhanî, serokê DYA'yê Donald Trûmp hişyar kir û got, "şerekî gengaz ê li Îranê wê ji her şerî girantir be."Li gorî nûçeyeke di çapemeniya Îranê de cih girtî, serokkomarê Îranê Hesen Rûhanî, bang li serokê DYA'yê Trûmp kir ku dest ji polîtîkayên li dijî Îranê berde.Rûhanî hişyar kir ku şerekî li Îranê biqewime, wê ji her şerî girantir be.Li gorî ajansa nûçeyan a Îsna'yê Rûhanî li pêşberî dîplomatên Îranê axivî û got, "Birêz Trûmp, bi teriya şêr nelîzin, ev ji poşmaniyan wêdetir bi kêrî tiştekî nayê." Roja Şemiyê jî lîderê olî yê Îranê Ayetûllah Elî Xameney, nerazîbûn raber kiribû û gotibû, piştî ku Trûmp ji hevpeymana nukleeerî ya 2015'an vekişiyaye, tu nirxê soz û axaftinên DYA'yê nemaye.



## Şoreşeke din a 19'ê Tîrmehê

Burhan ERDEM

Şoreşa 19'ê Tîrmehê ya Nîkaragûayê çîrokeke pêş-ciwaniya min e ku, di wan rojên destpêka jiyana çepgiriyê de, ji min re hatibû vegotin. Xuşk û birayên me weke şoreşa herî dawîn a cîhana çepgiriyê bahsa vî welatî dikirin. Xuşkên şoreşger, pirtûka bi navê 'Keçên Sandio' dixwendin. Birayên wan jî, peymana hevgirtina Sandinîstan a ku bûbû Eniya Rizgariya Neteweyî ya bi kurtehî weke FSLN dihate navandin dixwendin. Navê dîktatorê Nîkaraguayê Somoza bû. Beriya wî birayê wî Somoza û beriya wî jî Bav Somoza, desthilatdar bûn. Weke hemû dîktatorên Amerîkaya Latîn, wan jî digot ew rê li ber komunîzmê digrin û bi hêza Dewletên Yekbûyî Yên Amerîkayê (DYA)'yê xwe li ser piya dihişt.

Lê gelê bi dehan salan bêzar bûbû, xwe li FSLN'ê girtibû ku di hezîrana 1979'an de dest bi pêngaveke mezin kiribû. Di 19'ê tîrmehê de jî FSLN'ê dawî li wê desthilata Somozayan anîbû. Şoreşê lîderê xwe kifş kiribû; Daniel José Ortega... Ortegayê di rêveberiya Juntaya pêşiyê de cîh girt di sala 1984'an de weke serok hatibû hilbijartin û heta binketina welatên xwediyên reel sosyalîzmê, stêrka wî her biriqîbû. Lewra, DYA'yêhêzeke kontrayan avakiribû û li hemberî şoreşê dida şerkirin. Ev şer jî weke şerê herî qirêj ê dîroka Washintonê namdar bûbû. Lewra "Irangate"ê derketibû. CIA'yê ji bo li Nîkaragûayê Kontrayan xwedî bike, çek firotibû Îranê ku di bin ambargoya wê de bû. Wekî din, dîsa ji bo wan zarokên xwe yên ku bi qasî 30 hezar gelê sivîl qetilkiribûn, CIA'yê, bazirganiya kokaînê kiribû.

Li hemberî vana, Ji aliyê perwerde, alfabetîzasyonê, tendrustî û kêmkirina rêjeya feqîriyê ve sandinistan şoreşên di nava şoreşê de pêk anîbûn. Ji ber vê yekê jî, cîhana rojava mecbûr mabû vê mînaka hêja ya sîstema sosyalîzma parlementeriyê nas bike. Di sala '90'î de Ortega ji îktidarê ket û heta bêtirî panzdeh salan bi ser xwe ve nehat. Her hilbijartin ji bo FSLN'ê felaket bû. Lê Nîkaragûayê jî bobelatên mezin dijiya. Keraseta herî li pêş jî, birçîbûna gel bû ku polîtîkayên IMF'ê anîbû serê wan. Vê yekê hişt ku Ortega di sala 2006'an careke din were hilbijartin, ku heta niha sê caran ji van hilbijartinan serkeftî derketiye.

Belê, ji 18'ê Nîsanê û vir ve ye gelê Serokkomar Danîel Ortega sûcdar dikin ku dest daniye ser desthilatdariyê û azadî kêm kiriye, li kolanê ye. Çalakger dixwazin Ortega û hevsera wî Rosario Murillo ku Alîkara Serokkomar e, îstifa bikin. Bi şerê navbera hêzên paramîlîter ên ji FSLN'ê mane û mûxalîfên Ortega re Nîkaragûa hîn bêhtir dikeve nava şîdeteke giran.

Gelek kes îroj di wê qinetê dene ku ez jî tevlî wan dibim,; Nîkaragûa şoreşeke têkçûyî ye. Têkçûna wê jî bi destê şoreşgerên wê hatiye hûnandin. Lewra Ortegayê xwe dişiband Hugo Chavez, ji sosyalîstiyê veguhezî sosyaldemokratekî di riya awayekî din ê dîktatoriyê de. Herçiqwasî rewşa mirovên feqîr li gorî salên borî hinekî baştir bibe jî, ne ewqasî baş e û kirinên di çarçoveya kemberşidandinê yên ji bo IMF'ê, welatiyan bêzar dike. Ev bêzarî jî li kolanê veguheriye çalakiyan.